## Qasimlo: Rêberek demokrat û dijî olîgrşizmê

»»» R:3



## Di bîranîna pakrewan Duktor Ebdulrehman Qasimlo de (Diktor Qasimlo mamosteyê gelê xwe)

»»» R:6

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (474)07-22-2024 Buha (1000) Tûmen*

## Stêrkek li esmanê tarî

»»» R:4

## MIJARA QURBANÎKIRINÊ


»»» R:7

# Daxuyaniya Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta derbasbûna 35 salan bi ser terorkirina Dr. Qasimlo

Xelkê xebatkarê Kurdistanê!

Hevniştimaniyên azadîxwaz!

Hogirên hizir û kesayetiya bilind a Dr. Qasimlo yê rêber!




22ê Pûşpera îsal(13ê Tîrmea 2024), 35 sal bi ser vê rojê re derbas dibin ku şanda rêjîma terorîst a Îslamiya Îranê, "Dr. Ebdulrehman Qasimlo", Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, "Ebdullah Qadirîazer"ê endamê Komîteya Navendî ya Hizba me û Dr. "Fazil Resûliyan" ê dostê Hizba Dêmokrat û Şehîd "Dr. Qasimlo", li bajarê Viyenê de li ser maseya gotûbêjê teror kirin.

Terorkirina "Dr. Qasimlo", ji wan bûyeran e ku bi derbasbûna salan, ji bîra Hizba Dêmokrat û xelkê Kurdistanê naçe. Li vê derheqê de em dikarin îşarê bi komelek sedeman bikin ku wa kirin, yada vî rêberê mezin bi zindî bimîne û Hizba me û xelkê Kurdistanê li gelek boneyan de û bi taybet li 22ê Pûşperê, bi bîr bînin. Yekem sedem, ji girîngiya rola karlêker a "Dr. Qasimlo" li zindîkirina Hizba Dêmokrat li xwe digre. "Dr. Qasimlo" li destpêka dehika heftêyan a Zayînî de bi hevkariya hejmarek ji hevalên xwe, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ne bi tenê ji jihevbelavbûnê xelas kir, belku ji warê hizrî û siyasî û rêkxistinî ve jî kire Hizbeke serbixwe ya xwedî bername û pirêstîj û rêbaza taybet bi xwe; Hizbek ku digel serkevtina şoreşa gelan a Îranê li dijî rêjîma paşayetî, ew hitbar û şiyan peyda kir ku ji mîrata Komara Kurdistanê, serîhildana çekdarî ya salên 1346-47 û zêdetir ji 3 dehik tekoşîn û xebat û qurbanîdana kadir û endamên xwe li serdema dîktatoriya rêjîma paşayetî de xwedî derkeve.

Duyem sedema zindîmana yada "Dr. Qasimlo" li nav netewa wî û azadîxwazên Îranê de, ew role bû ku ew kesayetiya, li rêberîkirina Hizba Dêmokrat de piştî hatinaserkar a rêjîma Îslamiya Îranê, hebû. Rojhilatê Kurdistanê bi hatinaserkara a rêjîma nû, neinku her teslîmê gefxwarin û durûkiya taqîma desthilatdara nû bi rêberiya Xumêynî nebû û bi dirûşm û sozên wan nehate xapandin, belku daxwaziya netewî û dêmokratîka xwe xiste ber çavê desthilatdarên Tehranê û li ser daxwazkirina wan mukum bû. Pêgeha berfireh a olî û siyasiya vê serdemê ya Xumêynî ji rêderxistina dehan milyon kes ji xelkê Îranê û piraniya rêkxirav û kesayetiyên siyasî bi dirûşmên wî li dijî Amerîkayê, herwisa gefxwarin û êrîşa leşkerî ya Têhranê bo ser Kurdistanê , ti yek ji wan nekarî xelkê Kurdistanê çavtirsî bike ku dest ji daxwazkirina mafê xwe hilnegire. "Dr. Qasimlo" û Hizba Dêmokrat, tevî vê ku gelek hewl dan ku bi rêya aşitîxwazane daxwaziyên Kurdistanê digel rêjîmê çareser bikin, lê amade nebûn serê xwe li hember dîktatoriya rêjîma nû, biçemînin û li hember tepeserkirina maf û azadiyên netewa Kurd û xelkê beşên din ên Îranê, rêya berxwedan û xebatê li pêş xwe girt.

Serîneçemandin li hember dîktatoriya nû ji aliyê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve bilî naveroka xebtkarane û dûrbîniya siyasiya vê Hizbê, reh û rihîşe li têgihîştin û îradeya xelkê Kurdistanê de bi gistî hebû. Xelkê Kurdistanê ku dîrokeke demdirêj li xebat bi dijî dîktatoriya Pehlewî û tekoşîn bo mafên netewiya xwe hebû, bilî vê yekê, bi micidî li serhildana seranserî ya sala 1357 a Rojî de beşdar bû û qurbanî dabûn. Şanaziyek ku bo "Dr. Qasimlo" û Hizba Dêmokrat vedigere, li stuyê xwegirtina zêdetirîn rol li rêkxistinkirina xweragirî ya xelkê Kurdistanê li hember leşkerkêşiyên rêjîma nû ji aliyek û danîneberçav a zêdetir ya naveroka netewî û dêmokratîk li xweragirî û tevgera mafxwazaneya xelkê Kurdistanê bû. "Dr. Qasimlo" tevî pêdegirî li ser mafên netewiyên Kurd û netewên din li Îranê, daxwaza sîstemeke dêmokratîk bo birêvebirina Îranê û azadiyên dêmokratîk û daxwaziya jiyana azad bo xelkê dikir; bi eşkere, her cure dîktatoriyek ret dikir û bervanî ji ploralîzma siyasî û çendhizbî û çenddengiyê dikir.

Sêyem sedema bilindmana nav û yada "Dr. Qasimlo" li nav netewa wî û azadîxwazên Îranê de, pêywendî bi dîtingeh û hizrîna realîstî ya vî rêberî bo bihevrejiyan a cur bi curiyên li nav Îranê û hevpêywendiya tevgera Kurd li parçeyên din ên Kurdistana dabeşkirî bû. "Dr. Qasimlo" dijî her cure îdeolojî û hizîrîn û bawerekê bû ku Îranê bi tenê milkê neteweyekê an olekê bizane û xelkê wî welatî bi hevwelatiyên pile yek û du û pile sê jî dabeş bike. Ew bervwajiyê karbidest û ideolog û binav rewşenbîrên her

»»» Dom R:2

»»» Doma R:1

du rêjîmên paşayetî û rêjîma Îslamiya Îranê, îtirafkirin a desthilat û yasayên welat bi curbicuriya xelkê wî welatî û rêzgirtin û dabînkirina vê, bi dabînkirina yekparçeyiya Îranê û berdewamiya bi hevrejiyan û bi hevreman a rûniştiyên vê dizanî. Li hember de jî dîktatorî û sepandina sîstemeke santralîst, dabeşnekirina desthilat û beşdarînekirina netevên ne-fars ên Îranê li birêvebirina wî welatî, cudatîdanînên netewî, olî û regezî wek sedema bêhêziya yekparçeyiya Îranê û metirsî bo ser yekîtî û tebayiya rûniştiyên vê, mêzê dikir. Xala cihê lêhûrbûn û jêfêrbûn li derheq Îranîbûn û Kurdistanîbûn li dîtingeha "Dr. Qasimlo" de eva ye ku ti yek ji wan rastiyane nedibûne sedema giringînedan û jibîrkirin a ya din. "Dr. Qasimlo" li kom û komelên navnetewî û li hevdêtinên digel nûnerên dewletan, hizb û rêkxiravên siyasî û ragihandinan de, hevdem hem berevanî ji pirsa rewa ya netewa dabeşkiriya xwe û hewcehiya piştevanîkirina cîhanî li vê pirsê dikir û hem dibû deng û nûner û piştevanê tevgerên demokratîk û pêşkevtinxwaz û xebata rewa ya çîn û qatên cur bi cur ên Îranê.

Yekek ji taybetmendiyên bilind ên "Dr. Qasimlo", giringîdan bi şêwazên curbicur ên xebatê bû. Ev tevî ku aşitîxwaz bû û ji ti hewlekê bo çareseriya pirsa Kurdistanê bi rêyên aşitîxwaza ne xwe nediparast, lê berevaniya çekdarane ji netewa xwe li hember şerxwazî û êrîşên rêjîma Îslamiya Îranê, bo hêza pêşmerge bi rewa dizanî. Li demekê de rêberatiya tevgereke şoerşgêrane ya xwediyê hezaran pêşmergeyî dikir, li giringiya şêwazên xebat li navxweyê Îranê jî xafil nebû. Her bi qasa girîngîdana bi xebata berdewam li dijî rêjîma îslamiya Îranê li Kurdistanê, tekoşîna dîplomasî bi armanca rakêşana piştevanîkirin bo vê xebatê li derveyî welat de jî bi rê ve dibir. "Dr. Qasimlo" xebat bi tenê pêşmergatî û hilgirtina çek li dijî rêjîma Îslamiya Îraqnê nedidît. Girîngiya mangirtin û nîşandana nerizayetiya kedkaran li rêkarên çewsînerên dem û dezgehên hikûmî û xwediyên karan, dijayetiya ciwanan digel vê şêwaza jiyanê ku rêjîm dixwaze bi ser wan de bisepîne; Xweragiriya hunermendan û nivîskaran li hember kultûra paşvero bi rêkarên sepandî yên hikûmî û hewldana wan bo girîngîdan bi huner û wêjeya pêşkevtinxwazaneî ti yek ji wan li ber çavê hûrbîn ê wî rêberê mezin enda nebûn. Yek ji şêwazên xebat û berxwedana ku "Dr. Qasimlo" li dema xwe de bi diyarîkirî, nav jê anîbû û bi girîng zanîbû, serîneşemandina jinan li Îranê li hember hicaba bi zorê û raewstan li hember yasa û givaşên rêjîmê li vê derheqê de ye. Her wekî me mêze kir, pirsa jinan û bêzariya wan ji naveroka dije jin û paremayî ya rîjîma Îslamiya Îranê, li dehika pêncem a desthilatdariya vê rêjîmê de bi hilgirtina dirûşma "Jin Jiyan Azad"yê, mezintirîn serîhildana giştî li Kurdistan û hemû Îranê li pey xwe anî. Eva ku binyata dirûşma "Qasimlo, Qasimlo, rêbaza te berdewam e" li kom û kombûn û xwenîşandanên heyama vê serhildanê de li seranserê Rojhilatê Kurdistanê, deng vedida, zindîbûn û modernbûna hizir û bawerên vî rêberî û nêzîkbûn bi riha serdem û nivşên niha dide selimandin.

Li 35emîn salvegera terorkirina rêberê şehîd "Dr. Qasimlo" û hevrê ""Ebdullah Qasirîazer" û Dr. "Fazil Resûl", hewce ye ku em awurek bidne reftar û biryara dewleta "Otrîş"ê li derheq vê terorkirênê. Dewleta wî welatî, dema ku ew terora hate kirin, di cihê lêkolîn û spartina terorîstan bi dadgehê û sizadana wan, li lihevkirineke nihênî û bêşermane de, ew bo Têhranê şandin. Ji vê demê ve jî hemû deriyên xwe bo vekirina dubare ya dosyeya terorkirina "Dr. Qasimlo", daxistine. Bê şik hekî dewleta wî welatî ew terorîst bo Têhranê neşandina û rêgirî ji lêkolîn û lipeyketina sîstema dadweriya xwe li vê terorkirînê de nekiriba û wek welatê Alman rê daba ku terorîst bêne dadgehîkirin, aliyê kêm dadperwerî li derheq bikujan bi rê ve diço û birêveberên Têhranê wek çavkaniya bingehîn a vê tawanê zêdetir û zelaltir bi cîhanê dihate nasandin. Li pêvajoya lêkolîn li terorkirina Mîkonosê de me dît ku li ser lêkolîn û dadgehîkirina terorîstan de û binavkirina berpirsên pile yekem ên rêjîma Têhranê wek çavkaniya vê terorkirinê, pêdegir bûn, piştre jî biryara yekgirtî ya welatên endam li Yekîtiya Ewropayê li banghêjkirina balyozên xwe ji Têhranê, ew rêjîma neçar kirin ku bo heyamê çendîn salan dest ji kiryarên terorîstî li nav welatên Yekîtiya Ewropayê berde. Mixabin li wan çend salên dawiyê de careke din em nerimbûna welatên Rojavayî û lihevkirinê bêşermaneyên wan digel rêjîma terorîstiya Îranê dibînin. Ew siyaseta ku hejmarek ji welatên Rojavayî li xwe digre, handerê rêjîmê bûye ku zêdetir ji berê, rû bi barimtegirtina xelkê Rojavayî bi armanca lihevkirin û veguherîna wan digel terorîûstên xwe yên binçavkirî bike.

Em li vê hilkeftê de tînine bîra welatên Rojavayî ku xelkê serîhildayî yê Îranê, daxwaza tinêhiştina rêjîma terorîstiya Îranê dikin, daxwaz dikin ku spaha pasdaran ji aliyê wan ve wek terorîst bêne naskirin û rêkarên navnetewî bo lêkolîn û sizadana tawanên terorîstî û komkujiyên rêber û kadrên payebilind ên vê rêjîmê bêne diyarîkirin. Xelkê serî hildayî yê Îranê biryar dane bi destên betal lê bi fîdakirina baştirîn xortên xwe, dawî bi temenê rêjîmekê bîne ku jibilî vê yekê ku Îran bo wan kiriye dozex, bûye gefeke micid bo ser aşitî û aramiya Rojhiolata Naverast û deverên din ên cîhanê jî. Li vê derheqê de çavrêyê welatên Rojavayî ne ku siyaseteke rijd li hember vê rêjîma terorîst û fitneyên vê, bigirne ber xwe û piştevanî li xebata wan bo dawîanîn bi temenê vê dîktatoriyê bikin.




Li 35emîn salvegera terorkirina rêberê mê yê xwedî şiyan "Dr. Qasimlo" de bi pêzanînê awir li xizmetên vî bi Hizba Dêmokrat û tevgera netewî û dêmokratîka Kurdistanê didin, em şanaziyê bi hizir û bawerên vî dikin û wek çiraya rêya tekoşîna xwe, rohnioyê jê verdigrin. Em soza xwe jî nû dikin ku xebat bo gihîştin bi armancên ku vî, jiyan û canê xwe li pêxemê de fîda kir, bê sekinîn, berdewam bikin.

Hizba Dêmokrat a Kurdiatana Îranê

Navenda Birêveberî

22ê Pûşpera 1403 a Rojî

13ê July 2024

# Qasimlo: Rêberek demokrat û dijî olîgrşizmê



N. Elî Munezemî



Karakter û taybetmendîya herî bihêz a kesayetîya dr. Qasimlo demokratîkbûna wî e ku dost û neyarên wî li ser wê karakterê li hev dikin. Ew yeka jî dizivire bo wê rastiyê ku Qasimlo lîstika siyasî di civakê de, di navbera merivên wek hev de dibîne û hemû endamên civakê xwediyê nirxek wek hev dizane. Li ber ku meriv cihêrengin û her yek li wan dikare tiştekê di jiyana xwe de pêştirîtiyê bidê de, bes weha civakek ne xwediyê tenê yek tişta girîng û bilindtirîn armance, lê belê dikare bi qasî hejmara merivan armancê cihêreng tê de hebin û her yek li wan jî bo realîzekirina armancên xwe têkoşîn û xebatê bike. Li ber hindê jî gava ew dîktatoriyetê hildiweşînin, di navbera xwe de wekheviyê ava dikin û bi hilbiratinê desthilatdaran bo civaka xwe hildibjêrin. Yanî di hikûmeteke demokratîk de xelk azad e çi dikin û çi dibêjin. Lewre her kes dikare li gor keyf û selîqeya xwe jîyana xwe dîzayn bike. Ewa jî dibe sedem ku di civakê de selîqeyên cihêreng di civakê de derbikevin û hemû taybetmendiyên merivan xwe nîşan bidin. Ewa jî baştirîn cureyê hikûmetdariyê e.

Qasimlo awa kirin û berdewambûn desthilatdariyeke demokratîk girêdayî bi hebûna kesayetiya demokratîk a takên civakê ve dibîne û di wê baveriyê de ye ku bilindkirina asta demokratbûna takên civakê dikare desteberê îstiqrar û berdewambûna demokrasiyê bike di welat de.

Di hikûmetek demokratîk de zext li kesê nayê kirin ku bi zor barê desthilatdariyê dayne ser milê xwe û ne jî xelk neçare ku desthilatdarên nelayiq tehemul bikin.

Kesên olîgarş re tenê dewlemendî û pere girîng e û tenê kesên xwedî pere digihîjin desthilatdariyê. Li ber hindê jî hemû kes tê teşwîqkirin bo ku bo pere xerckirinê zêdegaviyan bavêjin û ew yeka jî piraniya civakê di feqîrîyê de dihêle. Ewy eka jî dibe sedem ku nerazîbûn di civakê de zêde be û li dijî desthilatdaran şoreş û serhildan çêbe.

Qasimlo dij-olîgarşî bû û ne tenê hewl dida ku di nav endamên rêberiya partîya wî de dewlemendiyek zêde kom nebe û rêberê zêde li endaman dewlemendtir nebe, di heman demê de bi xwe jî bibû mînak di bikaranîna servet û dewlemendiya xwe de ji bo pêşxistina têkoşînê. Ji ber ku eger sîstema olîgarşîk şûna demokrasiyê bigire, wê civakê bike du eniyên dewlemend û feqîr û di encamê de civak nikaribe xwe li hember dijminên xwe biparêze. Ji ber ku her du çîn mijûlî dijberiya hev dibin û dijminên xwe ji bîr dikin. Lewma olîgarş di her warî de têkçû û winda kiriye.

Carekê ku rojnamevanek li dr. Qasimlo dipirse «gelo servet û dewlemendiya te çend e?", Qasimlo li bersivê dibêje ku «dewlemendiya min evîn û xweştevitiya neteweya min e. Liber ku meriv çend dewlemend be bin pere, ew dewlemendî rojekê xilas dibe. Lê evîna netewê di dîrokê de tê nivîsandin û nayê jibîr kirin.»

Qasimlo bi wan pirsensîp û şîretên xwe desrên mezin bo me bi cih hêlane. Em jî dibe di jiyana xwe ya siyasî û di xebata xwe ya azadîxwazane de wam pirsensîpan bikar bînin. Eger em nekarin wî karî bikin, emê roj bi roj bibin sedemê qelsî û lawazbûna şoreşê. Li ber ku her pêngavekê ku em hildigrin bo aliyê olîgarşiyê, ew yek me li demokratîkbûn û şoreşgeriyê dûr dixe û wek dr. Qasimlo dibêje «her pêngavek ku em bo aliyê dîktatoriyê hildigrin, me li demokrasiyê dûr dixe û zivirîn dijvar dibe.»

Ez baverim ku ew pirensîpa ne tenê bo dema şoreşê, lê bo dema piştî serkevtinê jî girîng û sentral e. Bo hindê ku neteweya me piştî rizgariyê xweziya zivirîn bo serdema bindestiyê nexwaze, em dibe bi awayek rast tevbigerin û xizmet bi netewe û welat li serveyî hemû tiştekî re bigrin û ew baveriya ku dr. Qasimlo bi xebat û têkoşîn û reftara xwe di pratîk û axaftin û nivîsnê xwe di nava xelkê de pêkanî, em jî li ser wê rêyê berdewam bin û ew rê yê me bigihîne hemû armancan.





# Stêrkek li esmanê tarî



**N. Dr. Mecîd Heqî**




"Henry Ford" dibêje: "Yê ku hînbûnê diqedîne - anko dizane - 20 salî be an 80 salî, kal e. Yê ku hînbûnê bidomîne ciwan e. Di jiyanê de tişta herî mezin ew e ku hûn hişê xwe ciwan bihêlin".


Qasimlo çawa bû serkêşê dilê bi milyonan mirov û fikir û ramanên wî yên wekî felsefe û awayê jiyanê di civaka Kurd û Îranê de çawa cihê xwe girt? Divê nirxên wî di asta têkoşîna neteweyên di bin desthilatdariya Îranê de bibin nirxên neteweyî û gerdûnî û xeyalên wî yên di sedsala medyayê de bibin beşek ji plana navneteweyî ya demokratîkkirina Rojhilata Navîn a Mezin.

Armanca vê gotarê ne gotareke zanistî û lêkolînî ya li ser rêbaza Rêber Qasimlo ye. Xebateke wiha hewceyî lêkolîneke akademîk û nivîsandina têzeke li ser "hunera rêbertiyê" ya Qasimlo ye. Kesên ku li ser zanista Rêbertiyê lêkolîn kirine yan jî bi pirtûkên Rêbertî dizanin, dikarin bibînin ku rêbaza Qasimlo ya rêberî û birêvebirina tevgereke neteweyî ya demokratîk di destpêka salên 2000'an de bûye beşek ji zanista rêbertiyê li zanîngehên welatên pêşketî. Zanista serkirdayetiya biaqil an jî serkirdayetiya şiyanên ku Qasimlo di hejde saliya xwe de wek sekreterê partiyê pêk aniye û dîtinên wî yên dirustkirina paşerojê, ku beşek ji zanista serkirdayetiya stratejî ye, piştî têza wî ya li ser Kurdistan û Rêberiya Kurd, bûye zanistî. li zanîngehan mijara baldarî û lêkolînê ye. Em hêvîdar in ku xwendekarên kurd karibin vê dewlemendiya mezin a miletê xwe bikin mijara lêkolîn û ramanê. Çîrokên herî baş ên kesên ku di jiyana xwe ya şexsî, civakî, siyasî û rêkxistinî de bi ser ketine û hewl dane vê serkeftinê bi tevahiya civakê re parve bikin. Qasimlo di vî warî de di nav serkirdeyên Kurd de yekane ye û tenêbûn ji aliyekî ve cihê şanaziyê ye û ji aliyê din ve cihê nîgeraniyê ye.

Di zanistiya rêveberiyê de, pênaseyên cihêreng ên serok û rêveberan hene. Lê dibe ku, wekî ku nivîskarê Amerîkî "John Maxwell" dibêje, ravekirina çêtirîn ji bo danasîna serokekî gotinên serokê tîmê neteweyî yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî Jack Welsh-ê ya sedsala 20-an e: "Ez kesek ku dikare ecêb be, kesên din bimeşîne, yekî ku bikaribe rave bike û bide. piştgirîya dîtinên wî/wê bike "Kesê ku ji guherînê natirse û li hember wê serî natewîne. Dibe ku gelek xwendevanan mitînga 100.000 kesî ya Mehabadê ya sala 1979ê bi bîr bînin, dema ku Dr. Qasimlo îradeya gelê Kurd li ser partiya xwe ji gel re rave kir. Kêm rêber di şert û mercên şoreşê de, dema ku hesta beşdariya di şoreşê de li ser mentiqê dirêjbûna şoreşê be, dikarin gel bi vî rengî bihejînin, hêviya paşerojeke geş vebêjin û nêrînên xwe di nav de rave bikin. Di tehlîlkirina cureyê demokrasiyê, dirûşmên stratejîk û armancên pêşerojê yên HDKê de kêm kesan karîbû zanista siyasî bike edebiyateke gelêrî û armancên partiya xwe bi perspektîfa îradeya gelê xwe vebêje. Fêrbûn ne tenê bi xwendin û îdiaya zanînê ye. "Gandî" di meşa xwe ya dirêj de dema ku hevalên wî guman li serketina wî kirin, got: "Ez ê dest bi meşê bikim û gava ku ez diçim li paş xwe nenêrim."
Di sala 1988an de dema ku Ayetullah Xumeynî kasa jehrê vexwar, şerê Îran û Iraqê bi dawî bû. Ji bo Sekreterê Giştî yê Partiyê têkildarî rewşa têkoşînê ya piştî bidawîbûna şer civîneke giştî li mekteba siyasî ya herêma Qendîlê hate lidarxistin. Wê demê ez pêşmergeyekî 16 salî bûm, ez jî wek piraniya ciwanên Kurdistanê ji dîtina kesayetiya xwe dûr ketibûm. Dibe ku yên li salonê gotinên Qasimlo yên li ser paşeroja têkoşînê û bandora wî ya li ser tevgera neteweyî ya kurd baş bi bîr bînin û pêşbîniyên wî zû bi cih hatin. Heta niha mirov dikare weke hunera herî pêşîn a Qasimlo bihesibîne. Lê ya ku Qasimlo ji hemû hevdem û paşmayiyên wî cuda dikir, kûrahiya mirovperwerî û hezkirina wî ya jiyanê bû. Dema civîn bi dawî bû û em ji salonê derketin, derdor tijî zibil û paketên cixareya Pêşmerge û kesên ku li wir kar dikirin û dijiyan.

»»» Dom R:5

»»» Doma R:4



Qasimlo dest bi komkirina çopê kir û piraniya xelkê wir jî mînaka wî girtin. Rêberên mezin ew in ku bi kirinên xwe peyama xwe radigihînin û mîna Gandî li paş xwe nanêrin û meşa xwe didomînin. Di vî warî de, kesayetiya Qasimlo dikare bi kesayetiya serokê Amerîkayê "Theodore Roosevelt" re were berawirdkirin, ku axaftin û kirinên wî mînaka serkirdayetiyê û mînaka bihêzkirina kesên ku li Koşka Spî kar dikirin, bû. Wî karîbû bi kûrahî Partîya Komarî ji partiyeke muhafezekar bo partiyeke nûjen û pêşverû heta niha reform bike.

Hunera Qasimlo ne tenê ew bû ku mirov hêvî û şiyana ravekirina nêrînên xwe bike û piştgirî bide wan, ew jî mirovek bû ku ji guhertinê netirsiya û dev jê berneda. Dr. Qasimlo di dirêjiya jiyana xwe ya siyasî de hertim hewl daye ku di nava partiyê de nûjeniyê bike. Ji serxwebûna siyasî û rêxistinî heta Partiya Tudeh, însiyatîfa nepejirandina sîstema totalîter a Komara Îslamî girt, gotara demokrasiyê wek rêya herî guncaw ji bo çareserkirina pirsgirêkên neteweyî yên Îranê îcad kir û armancên paşerojê yên partiyê diyar kir. Têkoşîna neteweyî û diyarkirina perspektîfên partiyê ye. Ev nûbûn berhema rêbertiya Qasimlo ye. Mîrateya ku Qasimlo li pey xwe hiştiye, ne tenê nirxên partiyeke netewî yên weke Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ye, ev nirx li parçeyên din ên Kurdistanê û gelên din ên Îranê bûne nirxên tevgera neteweyî. Kesên ku dema Qasimlo ev raman îcad kirin û bi pêş xistin, li qada şer rawestiyan, îro xwe dilsoztirîn şopdarên Qasimlo dibînin.

Qasimlo di xebata xwe ya siyasî de di demeke kurt de hemû pileyên serokatiyê bi dest xist û bû rêberek tenê. Ew yekane ye ji ber wê yekê ku di heyama jiyana xwe de, çi wek kadroyek partiyê, him jî wek endamê serkirdayetiya partiyê û him jî wek sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, rêberekî rasteqîn bû. Qasimlo di serdema rêbertiya xwe de gelek derfet ji bo perwerdekirina rêberên paşerojê pêşkêş kir, rêhevalên xwe han da ku di warê rewşenbîrî û rêxistinî de nûjeniyê bikin û bigihin armancên xwe yên hevpar. Qasimlo girîngiyeke mezin da serxwebûn û sermayeya mirovî ya partî û tevgera xwe. Ji ber wê jî got, dibe ku em karibin ji welatekî din çek û pêdawîstiyan werbigirin, lê Pêşmergeyên Partiya Demokrat û piştevaniya gelê Kurdistanê mezintirîn sermaye û piştevanê têkoşîna me ne. Wî hevalên xwe teşwîq nekir ku jêhatîbûna serokatî û rêvebirina xwe baştir bikin. Qasimlo faktorên ku bûne sedema pêşketina partiya wî û tevgera di bin serokatiya wî de zanibû û hemû bi awayekî herî baş bi kar anî. Qasimlo hewl da ku partiya xwe bi rêkûpêk û sîstematîk perwerde bike. Avakirina dibistan û navendên perwerdehiya partiyê yek ji destpêşxeriya rêber Qasimlo ye ku gelek ji pêşengên tevgera neteweyî ya gelê Kurd tê de perwerde bûne. Mîrateya ku Qasimlo li pey xwe hiştiye bi salan ji jiyana wî dirêjtir e û ne dûrî jiyana partiya wî ye.

Qasimlo her çendî baweriya xwe bi Komara Îslamî ya Îranê nedianî, lê her çend ji ezmûnên berê zanîbû ku dijberên neteweya Kurd tenê bi zimanê tepeserî û terorîzmê dizanin, lê ji ber xwezaya mirovî û realîzma wî ya siyasî ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd. di Îranê de demokratîzekirin li Îranê, ber bi pîrbûnê ve çû û mirin û dema hînkirina etîka mirovî û helwêstên mirovî ji qasidên Komara Îslamî re, beqên kor nekarîn ronahiyê "tehemul bikin" û esmanê reş ê Îranê spî bibînin.

Di serokatiyê de mirov her ku pêşde diçe, ew qas hêsantir dibe ji bo guhertinê û bêtir rêber dikare ji bo guhertinê derfetên guncaw biafirîne. Her ku rêber mezin dibe, têkiliya bi mirovên di bin wî re xurtir dibe û şopînerên wî xwe nêzî serokê xwe dikin û li gorî wê astên mezinbûn û pêşkeftinê diceribînin. Qasimlo rêberekî bi van taybetiyan bû.

Qasimlo dizanibû ku pêşanî û hewcedarî dê li gorî dem û serdemê biguherin, lewra karîbû di her rewşa jiyana xwe ya serokatiyê de pêşaniyan biguherîne û stratejî û taktîkên pêwîst ji bo wan diyar bike. Cûdahiya di navbera serok û rêveberek de ev e ku rêber dûr dibînin û hewl didin ku di wêneya xwe de bandorê li mirovan bikin û wan ber bi pêşerojê ve bibin. Rêvebir dixwazin pergala "heyî" biparêzin û ji bo saxbûna xwe û rêza xwe li hember guherînê bisekinin. Lêbelê, her du jî hewcedariyên rêxistinî ne. Bi nûjenkirina xwe û bilindkirina hestek nasnameyek hevbeş, rêber pêşkeftinê geş dikin û bersiva "çawa" ya makîneya rêxistinê didin, û rêvebir jî bersiva "çi pirsa" ya rêxistinê didin.

Yek ji dersên herî girîng ên Qasimlo jî avakirina baweriyê ye. "Jean Mansol", yek ji nivîskarên herî mezin di warê serokatiyê de, dibêje ku rêberek ji bo ku pêbawer be divê xwediyê sê taybetmendiyan be: jêhatîbûn, girêdan û karaktera bêyî Ew ji hêla hevalên xwe ve têne efû kirin, lê yên ku di karakter û tevgerên xwe de xeletiyan dikin, Berevajî karakterê wan nayê efûkirin. Dr. Qasimlo dibe ku wek her kesê li cîhanê xeletî kiribe. "General Norman Schwartzkov" got: "Divê rêberek ji dîtin û karakterê tevlihev be. Lê heke em ê yek ji wan winda bikin, divê em dîtinê bavêjin û rûmeta mirovan hilbijêrin." Dr. Qasimlo Kesayet û kesayet di rabûn û ketina partî û tevgera netewî de xwedî mîras e. Dîroka PDKÎ di vî warî de ji dîroka gelek partî û neteweyên din cudatir nîne. Kesayetî û karakter ber bi baweriyê ve dibe û bawerî jî ber bi "serokatiyê ve diçe. Qasimlo ev plan hemû pîvan û bû rêberek bi wateya xwe. Bawerî tenê bi gotinan nayê bidestxistin. Dema ku rêberek kesayetek bihêz be, mirov jê bawer dike û şiyana wan zêde dibe. Bi vî awayî ne tenê şagirt ji paşerojê kêfxweş in, lê bi tevahî bi xwe û rêkxistina xwe ve girêdayî ne. Coş û hesta girêdana bi partî û rêkxistinên hizbî di dema Dr. Qasimlo de Kesayetiya Qasimlo ji aliyê dijberên xwe ve jî hurmeta wî girtibû. Niha jî rêzgirtina ji bo rêber di civakê de û heta di nav wan kesên ku berê dijminên wî bûn, bûye taybetmendiyek ku nayê guhertin.

Dîtina asoya pêşerojê ji bo serokek her tişt e. Aso hewcedariya bingehîn e. Aso, rêberê rêber e. Armanc ber bi gihîştina lûtkeya serkeftinê ve hişê dişewitîne û pêşveçûnê teşwîq dike. Li gor wî alîgir û peyrewên rêber bi tibûna wî agirî tevdigerin û ji bo xewneke hevbeş xwe endamên yek laşê dihesibînin. Rêberên bê asoya serokatiyê di karê xwe de serkeftî nabin û dibin parêzvanên "statûkoyê". Qasimlo xwedî armanc û asoyên dûr û dirêj bû. Ji ber vê yekê PDKÎ di 18 salên serokatiya wî de her roj nû dibû, pêş diçû û di asta herî jor de di rêxistinî, têkiliyên dîplomatîk û civakî de pêş ket.

Yek ji tedbîrên rêbertiyê jî perwerdekirina şûngiran e. Dr. Qasimlo di dema jiyana xwe de kariye gelek kesan perwerde bike, ku îro hinek ji wan serokên partiya wî ne. Lê bê şik Dr. Seîd Şerefkendî mînaka herî mezin û bihêz a serkirdayetiya Dr. Qasimlo ye. Wî karî di heyama jiyana xwe de kesekî rabigihîne ku di demeke nêzîk de Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) gihand asta herî giran a opozîsyonê di Komara Îslamî de, û serkirdeyên rejîma desthilatdar li Îranê bi metirsiya rûreşiya xwe, wî hilgirin. Îro piştî 35 salan ji Şehîdbûna Dr. Qasimlo di wê baweriyê de bû ku HDK partiyeke "îmkanan" e û her tişt û her derfet di wê partiyê de vekirî ye. Ji bo wê xewnê canê xwe feda kir û ji ber ku şiyana wî ya rêbertiyê hebû, bi milyonan Kurdistanî piştî 35 salan ji şehadeta wî heta niha jî baweriya xwe bi pêkanîna xeyalên rêberê şehîd tînin.

# Di bîranîna pakrewan Duktor Ebdulrehman Qasimlo de (Diktor Qasimlo mamosteyê gelê xwe)



**N. Hişmend Sêxo**
**Endamê Komîta Navendî ya Partiya Demokrat a Pêşvero ya Kurd li Sûriyê**



Duktor Ebdulrehman Qasimlo di sala (1930) de li bajarê Urmiyê li Kurdistana Îranê hatiye dunyayê , xwendina xwe ya seretayî û navîn li Urmiyê û Têhranê xwendiye , û piştre di sala (1948an) de çûye bajarê Istenbûlê da ku xwendina xwe ya Zanîngehê tewaw bike , piştre biryar stand ku xwendina xwe li Ewrupa tewaw bike. Dema ku ew li Istenbûlê wî nivîskar û rojnamevan "Mûse Enter" û xwendekarên kurd ên welatparêz naskirin, piştre çû Ewrupa ji bo tewaw kirina xwendina xwe.

Qasimlo li Firansa û piştre li Çîkoslofakiya zanistên rêzanî û civakî xwend lê qet ji êş û azara gelê xwe bidûr neket.

Qasimlo biryar da ku tevlî rikeberiya dêmokrat bibe ya ku li dijî impiryaliya Îranê bi pêş ket.

Di sala (1952an) de ew vegeriya welêt daku di xebata demokrat de beşdar bibe û Qasimlo pênc salan karê rêzanî bi şêweyên neyênî û aşkere dikir û hêdî hêdî Qasimlo weke kesayetiyekî rêzanî û xwedî bandor di nav gelê kurd û rikeberiya îranî de hate nasîn. Duktor Ebdulrihman Qasimlo waneyên destemayî û aboriya Sosyalîst li Zanîngeha Piragê didan , û ta sala (1961) waneyên zimên û çanda kurdî li Zanîngeha Sorbonê li Parîsê didan , herwiha xwedî rolekî girîng bû di avakirina Yekîtî ya Ciwanên Demokrat li Kurdistanê ku yek ji saziyên Partî Demokratî Kurdistanî Îran bû , û piştî demeke kurt bi fermî bû endamê vê partiyê û di hemû desteyên partîzanî de kar kir daku bû emîndarê giştî ji Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê re.

Duktor Ebdulrihman Qasimlo kesayetiyekî bibîr û hişmend bû , lewra wî û hevalên xwe yên partîzan bi hûrbînî rewşa rêzanî û aborî ya Îranê xwendin , herwiha rewşa çepên Îranê û tevgera niştimanî ya kurdî li gor pêywendiyên wî wek emîndarê giştî bi Yekîtiya Sovyêt re , û istratîjiya demokratî ji Îranê re û otûnomî ji Kurdistanê re bi rêket , û kongireya Sêyem a partiyê ev pêşinyarên Duktor erê kirin û ew pêşinyar bûn istratîjiya fermî ya Partiya Demoqrat û di wî kongirî de ew hate hilbijartin wek emîndarê giştî ji Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê re , û bû yek ji wan kesayetiyên rêzanî yên girîng di hemû parçeyên Kurdistanê de.

Hêjayî gotinê ku di sala (1978 an)de Duktor Ebdulrihman Qasimlo bi hevaltiya Bîst Hezar şervan ji hêzên pêşmergeyên dilêr operesiyoneke berfireh li dijî artêşa sahê Îranê rabûn û pêşmerge dest danîn ser bajar û bajarokên Kurdistana Îranê û wisa gelê kurd kevirê bingehîn ji avakirina dewleteke demokrat re danîn.

Di dîroka / 13 / 8 / 1989an de Duktor Ebdulrihman Qasimlo ji bo mafê otûnomî ji Kurdistana Îranê re danûstandin bi rayedarên Îranî re dikirin lê zor mixabin di wan danûstandinan de ew ji aliyê istixbaratên ku li kincên dîplomatê rêjîma Îranê ve li bajarê Viyêna li paytexta Otrîşê hate tirorkirin û di goristana pakrewanên şoreşê de "Pîrlaşêz" li Parîsê hate binax kirin.

Sed silav li giyanê te ey xebatkarê dilsoz û dilêr



## Nerîna



**“Mistefa Hicrî”:**

**“Em careke din emegnasiya xwe ji bo rihê pak ê şehîdên Viyenê dubare dikin. Lanet û şermzarî li rejîma terorîst a Komara Îslamî ya Îranê dikin.”**



**“Xalid Ezîzî”:**

**“Komara Îslamî rewatiya xwe ya navxweyî ji dest daye û bernameya xwe ya navokî û krîza berdewam ji bo parastina xwe bikar tîne. ”**



**“Mezlûm Ebdî” :**

**“Em amade ne bi hemû aliyan re, bi Tirkiyê re jî, danûstandinan bikin”**



**“Tucer Bkirhan”:**

**“Ger hûn di nava 22 salan de kurtejiyana Tirkiyeyê bikin, ne nan”**

# Helbestên Pûşperê



**N. Eskender Ceiferî**

Ji her salê zêdetir !
Qasimlû !
Çi qamçûr û çi nakam e dilê dujmin
Min qêrîna dayîkên şehîdan
Bi newaya dengê çekan
Di haşehaşa ava çem û kaniyên Zagrosê de vejand
Ji her salê zêdetir nêzîk im ji te
Qeliştîme, dirandîme dilê dujmin
Çi firfat e şelixtî ye dilê dujmin
Dayîka min digo lawo
Ecel xwazim miraza dil welatê min bike serbest
Egîd im ez qebala cendêkê min jî bi pêşkeş e
Piyar û vîn ji nirxên tev serokên xwe bi mîrat im
Eger xwazin bi aşîtî
Eger na jî
Bi zordestî dibim serbest
Zemîna dil parzemîna welatê min
Ji Îlamê heya Makû
Melik mot im ji bo dujmin
Çi volkanek bi vîn im ez
Dêmokrat im dêmokrat im
Şehîd Qadir Kerîmî me
Bilûra dil bi tenbûra çekê xwe me
Çi bê bak im serbixwe me
Çi sêwak im serbixwe me
Axîna dayîkên şehîdan im
Qasimlû me li Zagrosê
Taxim taxim evîna te
Dêmokrat im
----------
Bi 79 keibeyên ola şehîdan / Bi 79 rondikên daykên egîdan
Zimanê dujminê reşdil ji ber min / Bi dojeh bû bi 79 sal û heyvan
Biklukul dil tu rabûyî nerûnê / Bi 79 axînên bûkên li malan
Li benda hatina termên şehîdan / Bi her salek ji wan 79 ji salan
Çi qamûsan çi peyvek nîn e bo te / Şehîdên gel bi 79 sûnd û Quran
Dimînin tim li nav cergê me Kurdan / Li nava me bi 79 ol û dînan
-----------
Bi Rasana dilê gel, te agir tîn û gurr kir /
Bi biryara biharan, şehîdan te xelat kir /
Tu pêşmergê welat î, li her çar werz û salan /
Li Pûşperan xemîn im, ji ber xwîna egîdan /
Sermaweza dilê kul, ji dil dikim te pîroz /
Evîna te Dêmokrat, rengê şîrê dayîkan /
Fîraqê dil bi êş im, tewafa vî welatî /
Ji xew rabe welato, vaye Pêşmerge hatin /
Ne mêrkuj im ne jî şer, peyama min biratî/
--------
Tu peşmerg î evîn dayî bi Qazî
Dizanim ku tu narazî tu baz î
Tu saqî bî qedeh rakî çeka xwe
Ji dê û bav welatê xwe bi naz î
Nerazê dil nerazê can tu rabe
Hemû hêvî ji dujmin tu di Zab e
Bike qebqeb kevoka mendehoşê
Ku naxwînî welatê te xerab e
--------
Ji 79 doz û dijber her tu komar î dilan de
Gelek wêstgeh li paş 79 te bûrandin xezalê
Xezalokek li deşta şîn û giryana Mehabad
Ji Madkêw û li Urmiyê tu mad î ey Ehora
Tu komara bi kovana welat î tu leheng î
Vejîn bû yî ku xistî nav dilê dujmin nevîtî
Eger şa yan ku komarek ji sêdarên ji cehlê
Dinalînin hemû salan ji dest te karxezalê
Tu Qasimlû tu Kurdistan tu war î
Li nav deşta evîndarên welat î
Ne 11 meh, temendar î bi 79 sal û dewran
Tu nexşek bûy ji rengê agir û pêt û dêmokrat





# Serpêhatiya Rewşena Kurd ji rojavayê kurdistanê



N: Sumeye Mêrxas



Piştî şerek dirêj û qirêj, bajar hat dagirkirin û şer sekinî. Xelkê bajêr hêdî hêdî vegeriyan malên xwe û mabata Rewşenê bi xelkê bajêr re vegeriyan. Malbat li otombîlê siwar bûn û bi rê ketin, di riya vegerandinê de, Rewşenê dît alayên dijmin li ser çend avahiyên bajar hatine hildanê, ew pê hesî ku emberek ji agir di dil de hat vêxistin

Otombîl ket nava bajêr, û dîmena xaniyên wêran kirî zêde bûn, her der xerab, kevir li ser kêvir nema ye, û herçî hêstir ji çavan diherikîn.

Piştî demjimêrekê, malbat gihîşt gund, li pêşiya malê vemirand, Rewşen daket, dît deryê malê li ser piştê vekirî ye, ket hundir, û dît çawa mal hatiya talan kirin

Rûnişt li ser kevirekî û dagirî bi diya xwe re, bavê wê ber ve çû , destê xwe danî ser pora Rewşenê û jê re got: Êdî bes e keça min negirî, eger feyda girî heba, miriyê dê vegerîn jiyanê.

Roj derbas bûn û Rewşenê bi alîkariya malbatê xwe hinekî mal anîn ser hevdû. Çend malbat vegerîn gund û hinekî bêhna Rewşenê vebû. Lê dîsa di ser nîvî malên gund de ji malbatê çeteyan hat birin.

Çend meh derbas bûn, dibistan vebûn, û Rewşen bû mamoste li gund. Yek vê re hebû, navê wî mamoste Selah bû. Selah xortekî kurd bû, bi çeteyan re hatibû, rî û porên wî pir dirêj bûn.

Rojekê ji rojan, Rewşen çû dibistanê, waneyên xwe dan, û zarok derketin bêhnvedanê. Mamoste Selah hat cem Rewşenê, sekinî û jê re got: xwişka min Rewşen! Dixwazim çend şîretan li te bikim.

Rewşan: kerem bike mamoste.
Selah diaxivê, bay ku lê binêre, ji ber ku mirovekî dîndar e, got: xwîşka Rewşen! Wekî tu dizanî em misliman in, wekî ez dizanim hûn jî malbatek dîndar in. Tu çima cilên fireh û dirêj li xwe nakî û ser rûyê xwe nakirî?!!
Di vir de xwîn di serê Rewşenê de sekinî, sor bû, û bi hêrs got: mamoste Selah, tu kurd î, û tu baş zanê civaka me kurdî û cilên me çawan in, ne bes e tu bi wan re hatinûçûnê bikî, û te bi wan re welatê me dagirkir.
Tu li dijî kurdan rabûy, niha jî tu hatî şîretan li min bikî? Şiyar be tu kurd î!
Rûyê mamoste xeniqî, û ba bi ber lêvan neket. Tenê berê xwe guhert, dûr meşî cem zarokan.

Jiyan bi awayekî pir xirab û zor li ser sivîlên gund derbas dibû, û Rewşen hemî wextê xwe li dibistanê bi zarokan re derbas dikir.

Berî çûyna zarokan ji dibistanê, Rewşen di polê de bû. Li derî xistin û, çû vekir, dît mamoste Selah û zilamekî din li ber deryê ne.
Selah got: Mamoste Rewşen ev rêveberê perwerdehiyê yê nû ye mamoste Elî.

Rewşen lê nêrî û got: Tu bi xêr hatî.
Rêveber kenî û bi zimanî dewleta dagirker deng kir, lê selah ji Rewşenê re wergerand.

Pîştî danansînê û silavê Selah got: mamoste Elî hatiye ji bû rewşê dibistanê û şagirt û mamosteyan bibînê.
Li zarokan nêrî, çend pirs ji Selah kirin, û derketin derve.
Li derve rêveber li Rewşenê nêrî û got: Serkeftin be ji te re mamoste Rewşen.

Rewşen matmayî ma, lê nêrî, bi dilekî sar got: Tu sax be
Rêveber Elî kenî û got tu çima matmayî ma ye mamoste!?
Rewşen # tu kurd î!?
Elî: Erê.
Rewşen wê rojê, vegerî mal, nan xwar, ket odeya xwe, rûnişt, bi ser xwe de fikirî, û got: ev çawa çêbû?
Em sê kurd, yek destê xwe kir destê çeteyan û şer bi birayên xwe re kir, yek jî bi dewletê dagirkeran re hat, û ez.

Xweda ev çî ye? Çima weha bûye?!!
Çû cem bavê xwe, her tiştjê re got, û jê pirsî: bavo ! Çima wisa bûye!?
Bavê Rewşenê bi dilekî sar û çavên bi xemgîn got: keça min, em vegern dîroka xwe, emê pir mînakan bibînin wekî vê.

Ev ne cara yekemîn e kurd bi hev re şerê birakujiyê dikin, çi bi navê olan û çi jî bi navê partiyan
Ji ber vê cegerxwîn got: kurdino bibin yek. Eger hûn nebin yek, hûnê herin yek bi yek.
Lê mixabin, tu kes vê rastiyê nabihîsê.

# MIJARA QURBANÎKIRINÊ

N: Hesen Heranî

Yê ku herî zêde zanîn û zanyarîyên civakê guherandine û wateyên cuda cuda lê bar kirine bêguman ol in. Her wiha şîroveyên ol û oldarîyê ne.

Ev, hewldana bîyanîkirina heyîn û nîrxên civakê ne, pê re jî daxwaza vekişandina van tiştan ya cihê ji rastîyê dûr in.

Nixumandin û veşarî taybetmendîyekî herî girîng û ber bi çav e a van ol û bawerîyan. Lewra sedema vîya eve ku tişta pê bawerin jî nixumandî û veşartîye. Nayê zanînê û nayê dîtinê. Nezanînyarî têgînekî herî bi bandore li ser rûyê cîhana gîyanewer. Veşarîyerî jibo zêhn û têgîna mirov qadekî herî zehmet û tarîye. Di dîroka mirovahîyê de ev jibo mirovan bûye zemînekî tirsyarîyê. Ne tenê tirsyarî, bûye qadekî herî girîng ya îstîsnarîyê jî. Lewre her tiştê ne kifşîyar zemîna pir cureyên şîrove û îçtîdaêne. Tirsyarî xala mirov ya herî lewaz e. Nezanînyarî pişta xwe dide vê qadê û girêdayîyên vê qadê ji hêla hejmarîya mirovan de gellek zêdeye. Hemî ol jî pişta xwe disipêrin vê nezanînyarî yê. Lewra tirsnakî lewazî be jî, berevacî hêzekî herî kor û xeşîm e. Hêza bi tirsê were wicûdê hêza herî xeşîm û tûndirave ku ew hemî bereyên dîrokê de derketîye pêşîya mirovahîyê û bûye sedema gelek felaket û malwêranîyan.

Ev xal di dîroka mirovahîyê de ji hêla ruhî ve kifşyarîyekî mezin e. Di wê bawerîyê de me, ramana ku pêşî vê qadê kifş kirîye ramana îllahî a olperestîyê ye. Bêyî ku mirov cudabûn bike nava olan hema bêje hemî ol mijîna xwe ji vir digire û bi vê mêjeyê amoj dibin. Amejekarîya bi vê amojîyê merheleya herî berze di dîroka pêşketina olan de.

Îdeaya Xwedanî jixwe tiştekî veşarîye û kes nedîtîye, nabîne û nayê zanîn. Ew çax tirsyarî bi awayekî otomatîk dibe zaroka vê yekê.

Ol diba bavê vê tirsê. Jibo xwedê dibe tirskar, jibo ên hatine tirsandin an jî tirsîyane jî bêyî ku ji tirsê bên rizgarkirin, bi teslîmîyetê dibe garantorê xelasîyê. Hemî felsefa olperestîyê di van nîşeyan de tê ravekirin.

Dema rewş ev be, ew çax hemî têgînî û reng û teşeyê hizrê jî li gora vî tiştê veşartî tê wicûdê, reng digire ahengekî li ser hisyarîya qelbî digire. Ev bi qasî qada aqlî girînge. Di destpêka mirovahîyê de ev hatîye kifşkirin û heya miravahî hebe jî wê bi aqil re pêşbazî bike û bidome. Lewra ev beşekî beşerîye û bayê înkarê. Şûna mirov înkar bike riya pêre jîyînê bibîne baştir e.

Piştî avakirin û sererastkirina metaforekî wiha, qatmanîya wateyê jî ji qata yekemîn derbasê qatmana duyem dibe. Lewre li pişt dîwarê pêşîn ê watelêkirina îcaba qurbanîyê, dîwarek din jî ya cîguher hatîye avakirin û divê êdî wateya qurbanîyê jî li gorî reng û armanca dîwarê duyem bê amajekirin. Û wiha jî hatîye kirin. Yanî di qatmana pêşîn de ku armanc û wateya qurbanîyê dilxweşîya jibo dayîn û bereketa xwezayê bû, êdî ev îkameyê dîwarê duyem ku bi wateya Xwedanî û jibo hêz û qudreta wî hatîye amajekirin bû mrtaforekî mistîkî û veşarî. Êdî armanc ne nîşandana dilxweşîya, ji bo dayîn û bereketa xwezayê jibo memnûnkirina Xweda ye. Armanc jibo xwe rizgarikirina ji xezeba Xwedayê qahir û Qadir e. Divê dilxweşî ji wî re bê nîşandan û dilxweşîya wî bê girtin da ku ji xezeb û tofanan bên parastin.

Watelêkirina cejin û qurbanîyê jî yek ji van tiştan e.

Di dawîya hemî xwendina xwe ya li ser mirovên pêşîn, jîn û jîyana wan, her wiha li ser çavkanîyên cuda cuda di derheqê van zanînan de gihaştim vê encamê:


Di bingehê rîtuela qurbanîyê û cejnê de hurmetnîşana ji xwezayê û xwarin û xweyîbûnê ye. Mijara sereke rizqe. Her tişt jibo bexşîkirina xweyîbûna li xwezayêye. Yanî ji îcabkirina nîşandana dilxweşîyê ev qurbanîkirin dest pê kir an jî ji xweberve îcad bû.

A rastî destpêkirina guherîna ramanê û cîhguherîna nîrx û tiştên din di vê xalê de dest pê kir.

Di civakê de destpêkirina komelgehîyê, derketina qastê di nava komikên mirovan de bi xwe re ji nû ve şirovekirina vê rewşê anî holê.

Berê bawerîya wan (a mirovan) bi xwezayê bû. Wan tiştek çênedikir û nediafirand. Her tiştê xwe hazir û amade ji xwezayê digirt. Pincar, goşt, fêkî, gîya û av û hewa. Vana jibo wan sedemên dilxweşîyê bû.

Bawerî û zanîna wan, têgînî û şîroveyên wan jî li ser vê rewşa heyî pêşdiket û bi teşe dibû. Çiqas hurmet, şikir û dilxweşî li hember xwezayê bidana nîşandan bi gorî zanîna wan wê xweza jî ewqas comerd û bi bereke



bibûya.

Ew têgînîyekî herî baş û qewîn bû di hizr û jîyana mirovan de destpêkiribû. Ev awayê zanînê ne dihat îstîsmarkirin ne jî li hemberî hevdu dikarîbû bikarbînin.

Lê paşê çawa bû, çi qewimî ev famayî û îzanî him di hişmendî û zanîna mirovan de him jî di bawerî û teşeyê dilxweşîya mirovan de guherî?

Sedemên van guherînan ji hêla derûnî, civakî û guherîna şert û mercên jîyanî de ji hêla zanyaran ve tê lêkolînkirin û li ser fikir û îddîayên cuda cuda derdikevin holê. Ev mijar bi dawî nebûye û xuyaye ku wê demek dirêj jî wiha bi nîqaş û ramanên cuda bidome.

Lê tişta jibo mirovahîyê û jibo mecraya lêkolînerîyê zelal e ev xal in. Bi zêdebûna hejmarî ya civakê re derfet û hebûna alavên berdewamîya jîyanî jî kêm bû û mirovan hewcedarî bi şîrîkatîya komelgehî dît. Her wiha mirovan li beramberî riziqê hazir, hewcedarî bi afirînerî û amadekirina şêkirina riziq jî dît. Yanî mirovan jibo van şert û mercên zor û zehmet pêdivî bi yek kirin an jî tevlî kirina hêzê dîtin. Pêre jî afirînerîya kolektîf ya zad û nebatîyê kirin. Avakirina grûpên nêçîrê, grûpên avadanîyê û grûpên hilberînê çêkirin. Her ku mirov hatin ba hev û hêza xwe tevlî hêza hevdu kirin derfetên abadanî, jîyanî û hebûnê jî zêde bûn.

Ev di jîyana komelgehî ya wê demê de kifşekî herî girîng bû.

Jibo vê rewşa nû a heyî vêga hewcedarî bi watelêkirinekî nû, tezahurekî nû û honandina bawerîyekî nû çêbû û di nava kom û grûpan de tevî kesên zane û zîrek, kesên qurnaz, filevaz û firkone jî derketin û vana pêdivî bi destxistina hêzê dîtin.

Belkî şerê nav civakî ya li ser bidestxistina hêzê bi vî wayî derket holê. Lewre heta wê demê tenê kifşa hêza fizîkî hebû û ev ji bo nêçîr û şerkirina li heber bûyerên xwezayê derdiket pêş. Lê êdî kifşa hêzekî din jî hebû û ev hêz ne hêzekî yekser û otonom bû, ev hêz hêza kollektîf û ya bi hêza gelekan hatibû ba hev lê jibo rêvebirbirina vê hêzê jî îcada aqil çêbûbû. A rastî îcada awil na, kifşa aqil çêbû. Ev hêza duyen ya herî girîng bû. Hêza aqilê mirov

Ev hêz her tiştên diqewimîya li qabekî datîne, ji her tiştek re kirasek dibire û ji her tiştekî re şîrove û pênaseyekî dike. Û jîyanê dixe nava ahengekî cuda û nû. Ev di destpêkê de mirovan cezb dikir û îro jî wekî wê demê hîna jî cezb dike.

Ev şoreşa ramanî û aqlî ya destpêkê û yekemîn bû.

Lê ya xerab ew bû ku ev xal di dîroka mirovahîyê de her dem babeta îstîsmarêye û ev hîna jî wiha didome.

Îro qurbanîkirin ne pêwîste ku bibe mebestek îstîsmarê û jibo cîhan û jîyana ebed bê bikaranîn. Ev rîtuela dilxweşîyê ku berîya olên Semawî derketîye jibo dayîn û bereketa xwezayê bû. Îro ev bibe amûrekî bikaranîna îstîsmara bawerîya mirovan û wekî emrekî Xwedayî bi awayekî zerûrî li ser mirovan bê ferzkirin nabe.

Armanca qubanîyê îro dijare. Di her hêlên jîyanê de bi amûrên piştgirî û alîkarîyê yên cuda cuda dikare bê kirin. Armanca vîya divê tekez jibo alîkarîya xîzan û feqîran be. Ne hewceye ku îlle sewal jî bên serjêkirin. Şûna vê îbadetê de alîkarîyên cur be cur dikare were kirin. Ma armanc ne alîkarîya mirovan û şikirandin û dilxweşîya jibo Xwedanê hemî însan e!

Îro di vê serdemê de çawa ku mirovahî di gelek hêlan de di alozîyê de ye, ev mijarên bawerîyê jî şaş tên bikaranîn û zêdetir tên îstîsmarkirin. Bi îstîsmara vê yekê organîzasyonên bazirganî yên navdewletî bi xwe hene. Li ser vê qada îbadî sektorên mezin hatine avakirin û ti fêda vana ji feqîr û xîzanan re nîne.

Pêdivî bi fikrekî nû û çarenûsên nû heye.

# Tabloya azadiyê



N. Vênûs Fayîq
W. Hesen Mukerem



Yek ji rêzikên helbestê ku qet ez ecêbmay nekirim, helbestvanê Tûnisî Ebul Qasim El-Şeabî ye: "Ger miletek rojekê jiyanê bixwaze, çarenivîs divê bersivê bide. Eva qasa tevlîhevî û bê îradey ye y jiyana netewyekê li ser çarenivîsê hatiye ragirtin.. "

Ji bo ku her tiştê ku azadiya tevahî neteweyek pêk tîne têxe kasa çarenivîsê û li benda asman e ku wê wekî diyariyek bişîne, wirda koletî serkaniyekê verdigire ku tu çavnhêrî çarenivîsekê bî ku we rizgar bike ev yeka bi vê wateyê ye ku tu ti li azadî û daxwazên xwe tênegihîştî, çimkî azadî baran nine ku li ser me bibare, azadî yan heye yan tune, di dawiyê de jê bigire, ne hatin e çarenivîsek..

Azadiya tam tine ye, ew mîna perçeyên puzzlê ye ku tabloyekê çêdike, dema ku meriv wan hemûyan bigihîne hev û dîmen temam bibe. Azadî ne tenê bi rêvebirina serbixwe yan nîvserbixwe ye, çawa ku azadî ne tenê hebûna parlementoya ku endamên wê bi dengdanê têne hilbijartin e. Wê cesareta me tune ku bi sedan weşan û kanalên medyayî hebin.

Azadî tenê bi daketina kolanan û bilindkirina dengên berxwedanê pêk nayê, azadî koma giştî ya tevahiya wana ye ku tablo tevaw dibe..

Mahatma Gandî dibêje: "Bêyî azadiya şaşîtiyê tu azadî ne hêja ye, eger azadî şaştîkirin jî digel nebe. Ev hemû corên azadiyê li berçav girtiye û daxwaza azadiya şaşîkirinê jî dike. Her ji ber vê yekê azadî bi wateya giştî ya xwe çendîn pirsan ji xwe digir e.."

Bi çi dişbe ku em xwe azad bihesibînin, lê ne xwedî azadî bin ku ji bilî partiya ku em endamê wê ne, ji bo bidestxistina desthilatê guncavtir bifikirin? Çima em xwe azad bihesibînin û mafê me yê axaftinê heye, lê em nikarin partiya xwe rexne bikin ku em neyên cezakirin? Ger wusa be, em di cîhana derewîn de dibin doza xweşik.

Em dibin serhildêrê yekane yê dinyaya xerab. Em di awazên bêzar de dibin dengê gur..

Em ne xwediyê azadiya piralî ya rastîn di wateya rastîn de ne ku em dikarin bi serbilindî ji nifşên pêşerojê re bihêlin ji ber ku me hîn ew fêm nekiriye. Em her tim azadiyê di hevok û axaftinên xwe de dihêlin û dikin sernavê helbest, axaftin û beyanên xwe, lê heta niha me nekariye veguhezîne hundirê wijdanên zarokên xwe.

Di rastiyê de, daxwaza azadiyê ne tenê ew e ku em têgihîştina xwe ya azadiyê veguherînin ruhê rêveberiyê û wergerînin prensîbên ku di rastiyê de xizmeta kesên din bikin me xebat nekiriye bo azadiyê nekiriye bo heman sinaryû û heman ezmû beriya xwe dubare bikin. Belkû ew e ku ezmûn û şêwazek din a rêveberiyek din biafirînin û tiştê ku berê di hişê mirovan de hebû ji holê rake.

Hêza desthilatdar ku xwe ji gel veqetîne û ji serwe bo binî li gel mêze bike, helbet feraseta azadiyê di wê civakê de dixe metirsiyê, ji ber ku dibe hêzeke bereday û gel dereceyekê yan jî zêdetir li jêr xwe datîne û wirda jî hemû corên azadiyê çendîn hêlên tox li xwarê bîne.. .

Franklin D. Roosevelt çar cureyên azadiyê yên ku divê hebin ji hev veqetandiye: azadiya axaftin û derbirînê, azadiya ku hûn ji Xwedê re îbadetê bikin bi hildibijêrin, azadiya ji xizaniyê mebest aborî ye û ya çarem jî azadiya ji tirsê ye ev jî bi wateya vê ye ku ti kes ji vê yekê netirse ku bi sebeba yek ji azadiyan rûbirûyê mirinê dibe..

Nebûna azadîyê mirovên li dora desthilatdariyê dike sê par: Yên ku bi we re ne û ji we hez dikin, lê ne ewle ne, yên ku ji bo berjewendiyên xwe bi we re ne, ku ev core jî metirsîdar in û yên ku li dijî we ne dibe ku bi destê wan dawiya we pê bê..

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê kolberek li sînorê bajarê Banê, birîndar kir

Hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê teqe li kolberekî xelkê bajarê Banê kirin ku li encam de ew kolbere bi dijwarî birîndar bû û bo navendên pizîşkî li bajarê Tewrêzê hate veguhastiun.

Pêka rapora Ajansa "Kurdpa"yê, roja Dûşemî 25ê Pûşperê, kolberek ê bi navê "Sîrwan Resûlî", temen 32 salî û xelkê bajarê Banê, piştî vê yekê ku ji aliyê hêzên sinorî ve hatiye kutanê, teqe li pêyê wî kolberî kirine ku li encam de bi dijwarî birîndar bûye.

Pêka rapora Kurdpayê, ew kolbere bi sedema dijwariya birîna pêyê wî bo navendên pizîşkî yên bajarê Tewrêzê hatiye veguhastin.

Pêka amarên "Kurpa"yê li heyama 10 rojên derbasbûyî de hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îslamiya Îranê li Rojhilatê Kurdistanê de , bi teqekirin li kolberan 2 kolber û kasibkarek kuştine û zêdetir ji 13 kes jî birîndar kirine.



## 7 girtiyên li Seqizê bi cezayên hepsê, pere û cezayên temamker hatin mehkûmkirin

Kolberekî xelkê bajarê Banê ku bi sedema teqeya hêzên hov ên rêjîmê bi dijwarî birîndar bibû, li nexweşxaneya bajarê Sinê de li rewşa komayê de ye û asta hişariya wî %5 hatiye ragihndin.

Pêka rapora Ajansa Kurdpayê, Rewşa "Rêbwar Reşîdî", kolberê birîndarbûyî li sînorê Hengejalê, li halekê de ku pêyekî wî hatiye birîn, niha li rewşa komatyê de ye û pizîşkên nexweşxaneyê ragihandine ku asta hişariya wî %5 e.

"Rêbwar Reşîdî" li 17ê Pûşperê de ji aliyê hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê li sînorê Hengejalê bi awayekî dijwar hate birîndarkirin û hêzên hov ên rêjîmê bê agehdarkirina berê, li nêzîk ve teqe li pê û pişta wî kiribûn ku pêyekî wî li ser çokê re hatiye birîûn û niha pişikên wî jî rastî îltihabatê hatiye û ew xistiye rewşa komayê.

Pêka rapora Kurdpayê, li nexweşxaneya Sinê de derfetê bi ti kesekî nadin ku serdana wî kolberî bike.

Rêbwar Reşîdî bavê zarokekî ye.

Li heyama 6 heyvên despêkiya îsal, 33 kolber ji aliyê hêzên hov ên rêjîma Îranê li deverên sînorî de hatine kuştin û 254 kolber jî hatine birîndarkirin.



## Îran bo rojnamevanan bûye dozex

Rêjîma Îranê li tepeserkirina sîstematîk a rojnamevan li heyama 6 heyvan de zêdetir ji 34 rojnamevan û çakalvanên warê ragihandinê binçavkirine an sizayên sepandî bi ser wan de cîbicê kirine.

Pêka rapora "Saziya Berevanî ji Azadiya Ragihndinê" rêjîma Îranê bi awayê sîstematî li 6 heyvên destpêkiya sala 2024 a Zayînî de bi awayekî armancdar û berdewam, tepeserkirina ragihandin û rojnamevan li Îranê berdewam kiriye,

Pêka vê raporê, li heyama wan 6 heyvan de 126 dosye li dîjî rojnamevan û ragihandinan hatine çêkirin û 181 ragihandin, rojnamevan û çalakvanên warê ragihandinê rastî lêpisrsîn li dadgehên rêjîmê û navendên ewlehî hatine.




Pêka vê raporê, rêjîma Îranê hevdem digel tepeserkirina rojnamevan û ragihandinan, nûçe û raporên çewt û xapîner bi armanca ji rêdersitina raya giştî, bi rê ve dibe ku bikare bi awayekê rêgiriyê ji belavbûna fermî ya rastiyan bike.

Bi wî awayî Îran bo rojnamevan û ragihandinên azad, bûye dozexeke dijwar û metirsîdar.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (474)

